

*** ZANYARIYÊN GIRÎNG ***

SER ROTÎTIYÊ

Niştasihên birêz,

Îsal rojîtiya misilmanan ji **23.04.2020** heya **23.05.2020** dest pê dike.

Bo parastina hemû niştasihên, kêmsînoriyên heyî yên jêrê **bo dema rojîtiyê jî bi kar tên:**

- 1) **Qedexeya giştî ser pêwendiyê:** Hûn dikarin bi awayê giştî tenê bi kesekî din yan bi kesên ji malbata xwe re bin.
- 2) **Qedexeya ketina hundir avahiyê:** Qedexeye li avahiyê mêvanên we hebin yan serdana kesên li avahiyên din bidin.
- 3) **Qedexeya hevdîtina li avahiyê:** Hevdîtina bi ji pênc kesan pirtir di odeyên taybet ên avahiyê de qedexeye.

Xalên jêrê divê ji ber rewşa niha ya nexweşiya giştgir a koronayê bi taybet di dema rojîtiyê de were raçavkirin:

- Mizgeftên deverê hîn girtî ne. Îsal fitara bi komkî dê tunebe.
- Ji kerema xwe bi awayê taybet jî hevdîtinên fitarvekirinê nekin. Di odeya xwe de bi tenê yan bi kesên hevodeyên xwe re fitarê vekin.
- Ji kerema xwe bi hev re pehtinê nekin û hewl bidin bi tenê xwarinê amade bikin.
- Ji kerema xwe xwarina fitara xwe li sibê û nîvro amade bikin bo ku êvarê di heman demê li pehtinxaneyê hevbeş de gelek kes bi hev re nebin.
- Ji kerema xwe bi awayê taybet destûrên paqijiyê yên heyî li pehtinxaneyê raçav bikin û her tiştî beriya û piştî bikaranînê bişon.
- Li xwe û tenduristiya xwe muqate bin. Eger pêwîst be, dema hûn xwe nexweş û westiyayî hîs dikin, ser bipaşvehavêtina rojîtiya xwe û paş girtina wê bifikirin.

Ji bo têgihîştin û pêkanîna destûr û rênîşanên jorê gelekî sipasiya we dikin.

Em dixwazin hûn hemû tendurist bin!